

Werger pênasa gelan e

Dilnas Berazî

Werger roleke giring di danasîna gelan de, dilîze. Nexasim, ji bo gelekî mîna gelê kurd, werger gelek giringe. Ji ber ku dagîrkeran her û her em bi rûyekî reş dane nasîn. Ji xwe derfet jî nebû da ku kes me binasê. Heger çend pirtûkên rewşenbîr û nivîskarên me jî hebûn, ew jî, di quncikê xaniyan de veşartî bûn: Heger nivîskar bi xwe ne di zindanê de bûya.

Di sedsala dawiyê de, hindêk derfet çêbûn lê ew jî, kêr û qels bûn. Anku îro ji her wextekî bêtir, derfet hene ku werger rola xwe bilîze. Hem ji zimanê me bo zimanê biyanî û hem jî, berûvajîya wê ji zimanê biyanî bo zimanê kurdî.

Werger, xurtkirin û nûkirina zimane, dewlemendkirina çand û hunere. Heger ne ji wergerê bûya: belkî welatên Ewropa îro ne di vê astê de dibûn. Dema Osmaniyan welatê Yunaniyan dagîr kirin, hemû rewşenbîrên Yunaniyan berê xwe dane welatê Ewropa û li gel xwe hemû berhemên rojhilatî birin Îtalya û li wir belavî hemû dewletên Ewropa kirin. Ew berhem tevahî wergerandin ser zimanê Îtalî, Firensî, Elmanî û Îngilîzî. Ew wergera wan berhemên bû sedema herî giring ku ronansa Ewropa dest pê bikê. Anku ne şaşê ku mirov bibêje: Stûnê konê ronansa Ewropa ji behrem û ramanên Rojhilate.

Bêguman, îro li 127 dewletên cîhanê kurd dijîn. Anku van zimanan ji zimanê xwe yê zikmakî bêtir bi kar dihînin. Bi vî awayî kurd dikarin sudê ji 127 zimanan werbigirin. Çand û wêjeya wan wergerînin kurdî da ku gelê me dîrok û edebiyata wan gelan binase û xwe bi wan bide nasîn.

Lewra divê ku em kurd di warê wergerê de hinek gavên berbiçav bavêjin û giringiyê bidin vê yekê. Bi taybet dam û dazgehên kurdî divê piştevaniya vê yekê bikin û pêşde bibin. Bêguman berî her kesî ev erk yê rewşenbîr û zimanzanên kurde. Îro derfet hene ku gelê me bi serbestî rojname û kovarên xwe bixwîne û belav bike. Em tev zanin ku berî çend salan derfet nebû ku rojnameyeke bi tenê jî, bi serbestî bihête weşandin: yên ku bi awayekî dizî jî dihatin weşandin, nêrîna partî û koma xwe dida nasîn. Yanî ne xwendevan dikare sûdeke baş ji wê weşanê werbigre û ne jî nivîskar dikare xwe bigehîne xwendevanên xwe.

Lê îro, em êdî gihane pêvajoya nûkirin û xurtkirina ziman û weşanê. Divê êdî em hunerên xwe aşkere bikin û çanda cîhanê bi gelê xwe bidin nasîn û ya xwe jî bi wan bidin nasîn.

Netewên cîranên me, faris, tirk û erban gazinan ji dam û dazgehên xwe, ji rewşenbîr û wergêrên xwe dikin û xebatên wan di warê wergerê de, kêr û qels dibînin. Naxwe, gelo em kurd, di vî warî de çend li paşin. Yên wan bi sedan kenalê tv, radyo û bi dehan weşanxane û komên wergerê hene, yên me, hîn li ser tiliyan dihêne jimartin û xebateke li ser milê kesane.

Her çende di van salên dumahîkê de hindêk gav hatin avêtin û bi keda hin kesan xebatek baş bi rê ve çû, lê divê mirov palpiştiya wê bike da ku hîn gavên xurtir bihêne avêtin.

